Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1268 27-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Belavbûna şitilgehan giyanê bajar geş dike

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Welatiyê bi navê Ednan Mustefa ku xwediyê şitilgehekê li Qamişlo ye diyar kir ku armanca şitilgehan ne tenê frotina daran e, lê belavkirina çanda çandiniyê di nava civakê de ye. Di salên dawî de li bajarê Qamişlo gelek şitilgeh avabûne, armanca avabûna şitilgehan jî belavbûna keskayê û çandina gul û daran e. Çandina dar û gulan herwiha cûreyên cuda ên dîtir dihêle ku avhewaya bajar paqij bibe, bi armanca kêmkirina qirêjiyê şitilgeh zêde dibin.

Gelek şitilgehên giştî ji hêla şaredariyê ve hatine vekirin, di van şitilgehan de şitlên gulan û daran bi nirxên kêm tên firotin, di heman demê de jî şitilgehên taybetî ji aliyê welatiyan ve tên vekirin.

Welatiyê bi navê Ednan Mustefa ku ji Şehbayê ye û niha li bajarê Qamişlo dijî û xwediyê şitilgehekê ye ji rojnameya me re diyar kir ku karîbû di derbarê salên dirêj elaqeya xwe ya bi çandiniyê veguhrîne projeyeke domdar ku xizmeta civak û jîngehê bike.

Ednan Mustefa destnîşan kir ku dar ne tenê şînatîn e, lê ew beşeke ji jiyanê ne û belavkirina wê nameyeke domdar e.



### Ji ber hezkirina çandiniyê şitilgeh vekir

Ednan Mustefa ji sala 2011`an ve dest bi xebata şitilgehan kir, ji ber hezkirina wî ya ji xwezayê û belavkirina qadên keskayî, ne tenê bazirganî bû lê berovajî têkiliyeke kur di navbera wî û nebatan de ye, kêfxweiyeke taybet di lênerînan daran de dît. Bi derbasbûna demê re Ednan Mustefa dît ku îmkaneyên mezin ji vê qadê re heye, ne tenê ji hêla Aborî, lê di aliyê bandora erênî li ser civak û jîngehê. Edanan Mustefa tekez kir ku eleqeya wî bi daran re weke jêhatiyekê destpê kir piştre bû weke xebateke domdar û wiha got; "Min di çandina daran de kêfxweşiyeke taybet dît, her darek li pêşiya çavên min şîn bû hestên weke destkeftî bi min re çêdibû, riya min qet ne hêsan bû. Bi vê tecrûbeyê min gelek şitilgeh vekirin, tê de tevahî cûreyên dar û şînatiyan hene, her dareke şîn dibû min hîs dikir ku min muhreke kesk li ser vê xakê dixist."

Ednan Mustefa wiha got: "Min li Qamişlo li taxa Cumayê û li ser rêya amûdê û li Hesekê gelek şitilgeh vekirin, navenda sereke ya şitilgehan li Dirbêsiyê ye, tê de dar tên çandin berî ku em li beşên din belav bikin, di seranserî salê de karê me domdar e, pêdiviya daran bi lênêrîna domdar heye, em tu carî dev ji çandin û lênêrîna wan bernadin heya ku ew di rewşek baş de bighêje kesên ku dixwazin daran bikrin."

### Hilberîna dar û şînatiyan

Ednana Mustefa wiha domand: "Di şitilgehên min de darên: Zeytûn, Fisteq Helebî, Sinûber, Tirî, û Gul hene, daxwazên kesan û saziyan ji hev cuda ne, hin alî hewil didin ku projeyên çandina daran pêk bînin, darên cihêreng em peyda dikin li gorî pêdiviyan, her kesê ku darên fêkî dixwaze dê tiştê ku ew lê digerin bibîne hem kesê ku bixwaze şînatiyan biçîne ji bo xemilandina mala xwe, em gelek vebijarkan pêşkêş dikin."



Ednan Mustefa derbarê nirxê bihayên daran û şênatiyan de wiha anî ziman: "Nirxên daran ji nîv dolarî destpê dike heta 15 dolaran li gorî cûreya dar û meznbûna wê, em hewil didin nirxên guncaw ji hemûyan re pêşkêş bikin, ji ber ku çandina daran pêwistiyeke, divê her kes darekê li mal an jî erdê xwe biçîne."

### Rola şitilgehan di parastina jîngehê de

Mustefa da zanîn ku kirîna şitil û daran di dema dawî de bi sedema şert û mercên aborî kêm bûye û wiha got: "Li gorî demên berê kirîna welatiyan ji daran re kêm bûye, lê hin rêxistin hene di vî warî de piştgiriya şitilgehan dikin, ev yek dibe alîkar di domandina xebatên şitilgehan de."

Ednan Mustefa Tekez kir ku dar roleke giring di başkirina jinîgehê de dilîze û wiha berdewam kir: "Çandina daran dibe alîkar di paqijkirina hewayê û kêmkirina qirêjiyê de. Her dareke tê çandin ew îstîsmarkirina pêşerojeke baştrîne di di jîngehê de ye, em hewil didin ku bajarên me zêdtir kesk û xweşik bibin."

Ednan Mustefa di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Armanc ne tenê frotina daran e lê belavkirina çanda çandina daran di nava civakê de ye. Çandinî berpirsyartiya her kesî ye. Çandinî ne tenê kareke lê şêwazê jiyanê ye, hêviyê bi me re çêdike, her dareke tê çandina wê sûd jê bê girtin ji bo nifşên pêşrojê."

# Li Gabarê Darên Çilo li dijî qirkirinê serî hildidin

**Navenda Nûçeyan**

**Îsal tevî hişkî û qirkirkirina xwazeya li Çiyayê Gabarê jî Darên Çilo serî hidan û şîn bûn. Li vir dengê radyoya Rojava li çiyê belav dibe û bi xwezayê re dibe yek.**

Xwezaya Kurdistanê bi salan e bi destê dewletê û karmendên wê ve têye qirqir û talankirin. Bi teybetî li Şirnexê bi hinceta lêgerîna petrol û komurê her der hatiye wêrankirin. Li Çiyayê Cûdî xanên komûrê, li Çiyayê Gabarê jî lêgerîna petrolê berdewam dike. Bi teqemeniyan, şewatan û darbirînê xweza gav bi gav hatiye tunekirin.

Li tevî van êrîşên li ser xwazeyê jî li Gabarê bi hatine demsala biharê ve zindî bûnek heye. Wekî din jî li quntara çiyê dîmeneke bêhemba mirovan hembêz dike. Çiya wek qûleyek Asûriyan e û her derê dibîne. Tişta herî balkêş ew e ku li serê Çiyayê Gabarê kişandina radyoya "Rojava FM'ê ye. Dera rodya dikişîne tenê qûleyên leşkerî û qalekol hene. Li qûntara çiyê darên çilo pelên xwe nû vekirine. Ji Deşta Lala ya li serê Çiyayê Gabarê dema mirov dinêrî, Şirnex, Cizîr, Qesirk, Dêrgûl, gundê Şêxê Reş, Ziron, Çemê Şemo, Banêmihenda û Çiyayê Cûdî bi heybet tê pêşwazî dikin. Deşta Lala salên 90'î bi hinceta "ewlehiyê" ji aliyê dewletê ve hatiye valekirin û hêjî têketina gund û heremê qedexe ye.

Li Deşta Lala, kulîlkên biharê, pincarên xwarinê û ava vexwarinê tevî hişkiyê jî te peşwazî dike. Ava ji kaniyan diherike û gul û kulîlkên hêj nû vedibin mirovan sermest dike.



Sudoku: Bersiv 37

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 6 | 3 | 8 | 9 | 5 | 1 | 4 | 7 |
| 9 | 8 | 4 | 1 | 7 | 3 | 6 | 2 | 5 |
| 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 2 | 9 | 8 | 3 |
| 6 | 4 | 2 | 9 | 3 | 1 | 5 | 7 | 8 |
| 5 | 9 | 8 | 2 | 4 | 7 | 3 | 1 | 6 |
| 7 | 3 | 1 | 5 | 8 | 6 | 4 | 9 | 2 |
| 8 | 5 | 9 | 6 | 2 | 4 | 7 | 3 | 1 |
| 4 | 1 | 7 | 3 | 5 | 8 | 2 | 6 | 9 |
| 3 | 2 | 6 | 7 | 1 | 9 | 8 | 5 | 4 |

Sudoku:Pirs 38

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 1 | 6 | 5 | 9 | |
| 2 | 1 | 4 | | | 8 | 3 | | 6 |
| | | | 7 | | | | | |
| 9 | 2 | | 6 | | | | | 5 |
| | | | | | | | | |
| 5 | | | | | 9 | | 6 | 7 |
| | | | | | 7 | | | |
| 3 | | 9 | 1 | | | 8 | 4 | 2 |
| | 6 | 1 | 4 | 9 | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kose li pey rihê ket simbêl jî li ser danîn:**
- Çû da tiştekî ji xwe re bîne lê tişta di destê wî de jî jê standin.

**Kurmancê nezan got; bila bibe erzan, heta ku dev û deling lê bûn pizdan:**
- Dema yek li tiştên erzan digere lê di dawiyê de zererê dîbîne hingê tê gotin.

**Li jêr rih e, li jor simbêl in:**
- Tu çawa bikî her zerer e.

**Li tola dayê geriya li kêla bavê xwe hilnigift:**
- Xwest tiştekî bi dest bixe, lê tişta di destê wî de jî ji dest derket; xwest heyfa xwe bistîne, lê tişteke mezintir hat serê wî.

**Ma li ser av û rûyê xwe:**
- Ji dêrê jî bû ji mizgeftê jî; ji her du aliyan ve jî zerer dît.

**Malxirabbûn e:**
- Pir zerer e; ji wê zererê mezintir nîne.

**Malkambaxî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Malwêranî ye:**
- Bi heman wateyê.

**Me suhra xwe xwar:**
- Me jî para xwe ji lêdanê girt; li me jî xistin; me jî zerer jê dît.

**Mişkek dikeve sîtila şîr ew şîr tê rijandin:**
- Tişteke piçûk ya pîs dibe sedema zerereke mezin.

**Petrîşok pê de peqiya:**
- Zerereke pir mezin dît. (Petrîşok, bi lemên zebeşan ve tên. Piçûk in û nayên xwarin. Ku tav dide wan diteqin)

**Rût kir:**
- Zerereke pir mezin dayê.

**Şemitî:**
- Ji nezanîna xwe zerereke mezin dît.

**Şeh di serê wî de şkest/bi wî de tewiya:**
- Wî zerer dît; bela hat serê wî; sûcê wî tinebû lê ew sûcdar hat dîtin.

**Top avêt:**
- Tiştekî wî nema; malê wî tev çû; pir zerer dît; iflas kir.

**Tu wiha bikî dê dimire, tu wiha bikî bav dimire:**
- Tu çawa bikî her zerer e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


## Hevpeymana Civakî hîmê azadiya jin û wekheviya zayendî ye



Hevpeymana Civakî ya ku di sala 2023'an de hatibû îmzekirin, di nav xwe de ji bo jinan gelek xalên girîng dihewîne, ya balkêş jî ku wekheviya her du zayendan kirye bingeh. Herwiha di sazûmaniya giştî de avakirina rêxistinên xweser ji bo jinan misoger kiriye.**R-2**

## 'Em heya dawiyê piştgiriya banga Rêber Apo dikin'

Welatiyên bajarê Qamişlo anîn ziman ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo mercê bingehîn e ji bo pêkanîna aştiyeke mayinde û wiha gotin: "Heta ku banga aştiyê bibe pratîk, em ê têkoşînê dewam bikin'.**R-6**



## Bermahiyên şer li ser gelê Sûriyê metirsiyeke mezin daye avakirin




Bermahiyên şer jiyana sivîlên Sûriyê xistiye metirsiyeke mezin de. Li gorî belgekirina Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî piştî rûxandina rejîma Baas û heya niha li Sûriyê 875 sivîl ji ber bermahiyên şer hatine kuştin û birîndarkirin. Di nava vê mehê de jî 67 sivîl hatin kuştin û birîndarkirin.**R-4**

## Bi tabloyên neqşkirî, berhemên bi xweşikbûnê tijî ne diafrînin



Jinên xebatkar, hilberîner û afrîner li ber hemû astengiyên jiyan û civakê, tenê pêşxistina kesayetên xwe armanc kirine. Razî û Sûltan jinên kurd ku bi jêhatiyên kesayetî berhemên xweşik bi destên xwe amede dikin.**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1268 27-Nîsan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# KONFERANSA YEKRÊZÎ Û YEKHELWESTA KURDÎ WÊ BIBE BINGEHA KONGREYA NETEWÎ

Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê ku bi salan e nîqaşên wê dihatin kirin û ji bo tevahiya gelê Kurd wekî rêya yekem ya parastina hebûn û nasnameyê ye, êdî îro li Qamişlo tê lidarxistin. Ji Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê û deverên din ên Sûriyeyê zêdetirî 400 kes beşdarî konferansê dibin. Îro çavê bi milyonan kurdên her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê li vê konferansê ye, gelê Kurd hêvî dike ku wê ev konferans bibe bingeha kongreya neteweyî ya tevahî gelê kurd.**R-3**






## Amerîka û Çîn li dahola şerê aborî dixin!

Li ser bingeha sîstema kapîtalîst a netew-dewletê û aboriya serwer Amerîka û Çînê berê bazirganiya cîhanê didin rikberiya aborî. Wekî tê destnîşankirin ji biryarên bacan ên herdu aliyan gaveke metirsîdar e ku şerekî aborî li ser asta cîhanê derbikeve û civak jî bibe qurban jê re.**R-5**



Yekrêziya aliyên Siyasî li Rojava
Mihemed Seydî R-4



Em Dibin Yek Ku Neçin Yek Bi Yek!
Idrîs Henan R-5



"Kê me bixapîne ew ne ji me ye"
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# Hevpeymana Civakî hîmê azadiya jin û wekheviya zayendî ye

Hevpeymana Civakî ya ku di sala 2023'an de hatibû îmzekirin, di nav xwe de ji bo jinan gelek xalên girîng dihewîne, ya balkêş jî ku wekheviya her du zayendan kirye bingeh. Herwiha di sazûmaniya giştî de avakirina rêxistinên xweser ji bo jinan misoger kiriye. Lewra pêkanîna vê hevpeymanê li Sûriyê giştî demokrasiya hemû pêkhateyan û azadiya jinê misoger dike.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 12'ê Berfanbara 2023'an de bi tevlêbûna hemû pêkhateyan û 158 delegeyan, Hevpeymana Civakî hat îmzekirin. Bi vê hevpeymanê, dê hemû pêkhateyên netew û baweriyan xwedî heman maf bin. Hevpeymana Civakî di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hat îmzekirin. Di Hevpeymanê de tekezî li ser rola jin hatibû kirin. Herwiha hevpeyman xwe dispêre azadiya jinê, lewra pêwîst e cihê jinê di vê hevpeymanê de xurt û parastî be.

### Îradeya jina azad bingeha azadî û demokrasiyê ye

Di hevpeymanê de ji bo jinan gelek xalên balkêş û girîng hene, ji wan 10 madeyên hevpeymanê ku têkildarî berpirsyarî û mafên jinan e û ew made jî ev in: (13, 14, 15, 16, 17, 29, 30, 31, 82 û 76). Ne tenê çend made, aliyê teorî yê hevpeymanê bi gelemperî xwe dispêre azadiya jinê. Ji ber ku li ser hîmê rêxistin û hevpeymana di navbera gelên civaka demokratîk, polîtîk û exlaqî de hatiye nivîsandin. Ev 5 hezar sal in hişmendiya civakê li ser hîmên navendîbûnê ango desthildariya mêr hatiye avakirin. Ev jî li ser rêgeza koledarî û teslîmgirtina jinê pêk tê. Bi pêşketina sîstema navendî re wekheviya di navbera jin û zilam, xweza û mirov, herwiha di navbera mirovan bi xwe de jî hatiye rakirin. Têkiliyek li ser hîmê milkbûnê pêş ket û çanda komînal hêdî hêdî ji holê radibû. Lê eger em bixwazin îradeyek azad a ferdên civakekê derxînî û wekheviyê pêk bînî, wê demê îradeya jina azad bêguman divê bê parastin. Ev jî bingeha azadî û demokrasiyê ye. Ji ber eger jin azad nebe civak azad nabe, civak azad nebe wekhevî çênabe, wekhevî nebe jî sîstemek demokratîk misoger nabe.

### Madeya 14 tevlîbûna wekhev a herdu zayendan

Madeyên hevpeymanê xwe dispêrin pîvana temsîl û tevlîbûna wekhev a herdu zayendan. Ev jî bi riya hevserokatiyê pêk tê (Madeya 14). Bi vî rengî di sazûmaniya biniya wê de jî wekhevî tê parastin. Di nava vê sîstemê de jî, ji bo jinan bi awayekî xweser sazûmaniyeke rêxistinî tê avakirin ku ev jî dibe temînata hemû jinan. Lewre li rex tevlîbûna wekhev, hevpeyman maf dide jinan ku rêxistina xwe ava bikin û sîstema xwe ya xweser di hundirê sîstema giştî de diyar bike. Ango di biryarên xwe de serbixwe bin. (Madeya 14)

Di vê navberê de pareke cûda ji sazî û rêxistinên jinan re tê destnîşankirin. Ango li rex wê parê jî ji bo pêkhateyan, para xweser a jinan ku tevgerên jinan ên azad diyar bikin jî heye.

### Madeya 30 jin di hemû qadan de bibe xwedî cih

Herwiha jin dikarin di hemû qadên jiyanê yên siyasî, civakî, çandî, perwerde, aborî û hwd… de cih bigirin û xwe temsîl bikin. (Madeya 30)

### Madeya 82 mafê jinan heye ku di hemû saziyên dada civakî de cih bigre

Mijara din a girîng jî cihê jinan ê di sîstema dada civakî de ye. Li gorî hevpeymanê mafê jinan heye ku di hemû saziyên dada civakî de bi temsîl û tevlîbûna wekhev cih bigirin. Di heman demê de mekanîzmeya xwe ya dadê ya xweser ava bikin. Di vê çarçoveyê de têkildrî dozên girêdayî jinan, mekanîzmeya jinan a di dadgehê de biryar digire. Ev ji komîteyên lihevanînê û malên jinan dest pê dike û heya giştî dadgehan belav dibe. (Madeya 82)

### Madeya 13

Di aliyê aborî de jî nêzîkahiya ku bi cave "mal-tişt" li jinan dinêre, wekî sûc hatiye binavkirin. (Madeya 13).

### Madeya 17

Di nava malbatê de jî li ser rêgezên hevpariya jiyanê jin xwedî îradeyek azad e (Made 17).

### Madeya 29

Dîsa tundiya li hemberî jinê û ferzkirina cûdahiya neyînî di navbera herdu zayendan de, sûcekî ku qanûn hesaba wê dipirse ye. (Madeya 29)

### Sedemên destnîşankirina parên ji bû jinan di Hevpeymana Civakî de

Sedemên vê veqetandinê yên sereke dîrokî ne. Jin bi awayekî gelemperî di nava civakê de ne rêxistinkirî ne. Jinên bê rêxistin jî her çiqasî weke ferd di nava sîstemê de hebin jî, lê ji ber ku ne rêxistinkirî ne, ew ê tenê weke hejmar li ser jin bê hesibandin û tu rola wan di têkoşîna zayendî ya azadiya jinê de nebe. Lewre di temsîliyeta wekhev de, di nava temsîla jinan bixwe de jî wê kotayek ji bo jinên ku baweriya xwe bi azadiya jinê tînin bê veqetandin. Bi vî rengî tê hedefkirin ku jin pêşengiyê bikin û mafên jin biparêzin. Jina azad weke xetere li ser hişmendiya heyî tê dîtin, lewre di nava giştî de piranî jinên ku nikarin qale mafan bikin, herwiha mafên xwe û jinên din biparêzin tên hilbijartin.

Mînaka vê yekê jî gelek caran hatiye dîtin. Jin heya asta serokên dewletan jî derketine, lê bûne amûrên şerên mezin, kuştin, wêranî û tundiya li ser jinan bixwe. Lewre tedbîra vê yekê, kotaya tevgerên azadiya jin û ciwanan hatiye destnîşankirin.

### Hevpeymana Civakî di sazûmaniya giştî de avakirina rêxistinên xweser ji bo jinan misoger kiriye

Pîvan e ku jinên sîstema federasyona demokratîk ji qada xweser diçin nava qada giştî. Yanî eger li gundek, bajarek an jî herêmekê hilbijartin çêbibin, wê lîsteya navan hebin. Wê demê hemû tevgerên jinan bi nasname, ol, netewe û hwd… kom dibin namzetên xwe derdixin, paşê pêşkêşî qada giştî dikin. Dibe ku jinên serbixwe jî hebin, lê ya bingeh ew e ku tevgerên jinan lîsteya namzetên jin derdixînin. Ev jî dihêle ku jin xwe li derveyî tevgerên jinan nebînin. Herwiha hemû biryarên derheqê jinan de, ji aliyê sazûmaniya xweser ve tên girtin. Mînak dema di herêmek, di desteyek an jî komîteyekê de cihê jinekê bê guhertin, jinek ji erk bê girtin an jî jinek tevlî xebatê bibe, wê demê ancax meclis, deste yan jî rêveberiya herêmê vê yekê ji sazûmaniya jinan re pêşniyar dike. Rêxistina jinan bi xwe jî biryara vê yekê dide. (Madeya 31) Ji xwe li gorî madeya 76'an jî desteya azadiya jinê jî hatiye diyarkirin. Wekî encam dikarim bêjim ku cihê jinan di vê hevpeymana civakî de xurt û parastî ye. Di hin mijaran de jî weke rêgezên giştî, maf an jî hikmên giştî hatine destnîşankirin.

### Hevpeymana Civakî ji bo jinên giştî Sûriyê azadiyê misoger dike

Di roja îro de bi kirîzên ku Rojhilata Navîn û geşedanên ku li Sûriyê rû didin, Hevpeymana Civakî ya giştî, hem jî xal û madeyên girêdayî jin dikare bibe cihê çareseriya hemû aloziyan. Herwiha madeyên girêdayî jin ji bo jinên giştî Sûriyê azadiyê misoger dike. Da ku hişmendiya bi hezarên salan xwe li ser jinê dûbare neke, pêwîstiyeke mezin a pêkanîna Hevpeymana Civakî ji bo giştî Sûriyê û Rojhilata Navîn heye. Ev yek jî bi guhertina hişmendî, rêxistinkirina jin û civakê û avakirina civakeke exlaqî û polîtîk heye.








# Ciwan Ibrahîm; Dîwana Kî Me Ez eşqek di dilê min de çêkir

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê Ciwan Ibrahîm diyar kir ku yekem berhem bi zimanê kurdî ku wî xwendiye û bandoreke mezin lê kir, dîwana Seydayê Cegerxwîn ya bi navê 'Kî Me Ez' bû.

**Ayşa Silêman/Dêrik**

Helbestvanî kurd Ciwan Ibrahîm di sala 1962'an de li gundê Kasanê yê girêdayî herêma Dêrikê jidayîk bûye. Wî xwendina seretayî li gundê xwe xwendiye û xwendina navîn û amadeyî li Dêrikê qedandiye. Piştre wî Peymangeha mamostetiyê li Bajarê Hesekê xwendiye û piştî wê zanîngeh beşê Perwerdeyî bidest xistiye.

Di derbarê jiyan û xebatên xwe yên çandî de, helbestvan û endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ciwan Ibrahîm ji Rojnameya me re axivî.

### Kurtejiyana Ciwan Ibrahîm

Ibrahîm da zanîn ku jiyana wî ya li gund ji ber xizanî û feqîriyê bi zor û zehmetî derbasbû û wiha got:"Ji ber nebûna derfetên kar malbata min neçar ma berê xwe bide bajarê Dêrikê. Ji ber ku min dixwend birayê min yê ji min piçûktir kar dikir ji bo debara malê. Min gelek ji xwendinê hez dikir, dema ez piçûk bûn bavê min helbestên Melayê Cizîrî dikirin qesîde û digotin. Wî stranên gelêrî û filiklorî jî digotin, lê piştî ku têkiliyên wî bi mala şêx re çêbû û bû older ev yek bandoreke neyînî li me kir. Ew çanda kurdî ya resen di mala me de nema, êdî dest bi helbest û dîwana Melayê Cizîrî kir. Dema ez piçûk bû sofî li mala me kom dibûn bavê min jî helbestên Melayê Cizîrî bi awaz ji wan re digotin. Ji ber min li dengê bavê xwe guhdar dikir, hezkirina min ji helbest û wêjeya kurdî re çêbû, êdî ew helbestên ku bavê min dixwendin min ezber dikirin. Dema ez refa 10'an bû hin waneyên min yên bîrkarî hebûn min fam nedikir min berê xwe da mala cîranê me da ku



waneyê bide min navê wî ismaîl bû li çiyayê azad Şehîd ket, li wir min Dîwana Seydayê Cegerxwîn Kîme Ez dît û biryar da ku bixwînim. Dema ez refa 5'ê bûn bavê min ez fêrî tîpên kurdî kiribûm, lewma hinekî min dikarî ez bixwînim. Ev pirtûka yekem bû ku min bi zimanê kurdî dixwend û gelek bandor li min kir. Ji ber ku hezkirina min ji wêje û helbesta kurdî re hebû, lewma min di refa 12'an de dest bi nivîsa helbestan kir."

### 'PKK'ê bû hêvî ji hemû kesên hejar re'

Ibrahîm axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: "Min du salan li Hesekê peymangeha Mamostetiyê xwend, ji ber kêmbûna derfetan û xizaniyê min nikarîbû li Şamê bixwînim. Li gor pileyên min erdîngarî ji min re derket lê hezkirina min ji sporê re hebû. Min berê xwe da Helebê da ku xwe di peymangeha werzîşê de tomar bikim, lê ez ji tomarkirinê bêpar mam ji ber ku ez rojekî dereng mabû. Piştî ku min li Hesekê Peymangeha Mamostetiyê bidawî kir ez salekî bûm mamoste û çûm leşkeriya dewletê. Piştî 2 û nîvan min leşkerî bidawî kir û careke din vegeriyam mamostetiya xwe. Di wan salan de jî tevgera PKK'ê di Rojava de xurt bûbû, ev partî bû hêvî ji hemû kesên xizan û xwendekaran re. Êdî hemû xwendekaran berê xwe didan pirtûkên siyasî û dîrokê da ku bixwînin. Piştî ku min leşkerî bi dawî kir bi çend rojan, Şehîd Mihyedîn hat gel min û me gelek nîqaş kir li ser rewşa siyasî ji min xwest ku ez jî tevlî kar bibim. Ji sala 1987'an heya 1997'an de di nav gel de min xebatên partiyê didan meşandin ji milê hişyarkirin, dayîna daxuyaniyan, belavkirina belavokan û me beşek ji wan fêrî tîpên zimanê kurdî jî kirin. Di sala 1990'î de komên me yên Newrozê çêbûn, girûpa çandî jî hat çêkirin, kesên ku gotar, çîrok û helbest dinivîsandin em li hev kom dibûn û me berhemên hev nîqaş dikirin. Di sala 1996'an de di navbera Sûrî û Israîl de nexweş bû, wê demê hikumetê navê min xwestin da ku ez reserve bim di leşkeriyê de. Min gelek hewildanên xwe kirin ku ez tevlî partiyê bibim lê partiyê qebûl nedikir, ji min dixwestin ku ez di nav gel de bimînim, ez neçar mam 45 rojan herim leşkeriyê."

### Berdewamkirina xebatên partiyê di nav civakê de

Ibrahîm axaftinên xwe domand û wiha got: "Di sala 1997'an de dewletê ez ji kar avêtim, 4 salan ez bêkar mam û min berê xwe da Libnanê li wir hêviyên min pêk nehatin ez careke din vegeriyam Dêrikê. Êdî min dest bi kar kir çi himaltî, bilokçî û teyantî ban. Di sala 2000'an de careke din çûm Beyrûtê û li wir fêrî boyaxtiya malan bûm. Li Beyrûtê jî min perewerdeya ziman dida karkeran, li wir hevalek min ji min re got ku xalekî wî heye dikare bi min re bibe alîkar heya ku ez li mamosetiya xwe veger im, min hêviyên xwe qutkiribûn ji ber ku ez berî wê gelek caran çûm ji min xwestin ku ez bibim ajal û bi wan re kar bikim heya ku min careke din vegerînin kar. Lê dema ez çûm cem xalê hevalê xwe ji min re got ez dikarim te vegerînim rewşa te hîsane lê pêwîste tu pereyan bide, min qebûl kir heftiyek bûrî û min dest bi çêkirina kaxezên xwe kirin û careke din dest bi mamostetiya xwe kir. Nêzî du salan min li gundan mamostetî kir û paşê vegeriyam Dêrikê, tevî karê mamostetiyê jî, min xebatên partiyê hîn di nav civakê de berdewam dikirin."

### Belavkirina çanda xwendina pirtûkan

Di sala 2011'an de piştî ku şoreş dest pêkir, heval Hisên Şawîş hat gel min da ku ez waneyên ziman bidim hevalên jin. Me bi dizî di malan de dest bi wanedayînê kir, di 12'ê Cotmeha sala 2011'an de me dibistanek li gundê Bestasûs bi navê şehîd Dicle bi şahiyeke mezin vekir û li wir dest bi perwerdeya zimanê kurdî kir. Piştî wê di meha Berfanbar de bi awayekî fermî me Saziya Zimanê Kurdî li taxa Sor li Bajarê Dêrikê vekir û ez 4 salan bûm berpirsiyarê saziya ziman. Di sala 2013'an de dewletê hijmarek ji Kesan ji kar avêtin û ez jî di nav lîsteya yekem de bûm ku ji kar hatim avêtin. Di sala 2014'an de ez çûm komîteya amadekirina minhacê dibistanan, du mehan ez mam li wir. Di heman demê de komkujiya şengalê çêbû û xelkê Şengalê koçber bûn ez hatim erikdar kirin ku li Kempa Newroz wan zarokên koçber bi rêxistin bikin û ji wan re dibistanan vekin, me him perwerde dida mamosteyan û him jî me dida xwendekaran nêzî salekî li wir mam. Ji sala 2014'an heya 2019'an pirtûkxaneya Çand û Hunerê kes têde nebû min ev erk girt ser milê xwe ku bibim berpirsê wê. Dema Yekîtiya Rewşenbîran hat avakirin ez rêveberê wê bûm, me civînên xwe di pirtûkxaneyê de çêdikirin da ku sardana pirtûkxaneyê were kirin û çanda xwendina pirtûkan belav bibe. Heya niha jî endamê yekîtiya rewşenbîra me."

### 'Vekirina peymangehê xewna min ya duyem bû'

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê Ciwan Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: " Di sala 2016'an de Zanîngeha Rojava hat vekirin, ez çûm wir û min 3 salan waneyên wêjeya Kurdî û Şêwaz dan. Ji ber ku rewşa min ya tenduristî nebaş bû ez vegeriyam bajarê Dêrikê û min 3 salan mamostetî kir. Di heman demê de min di qenala Ronahê de 23 xelek ji bernameya Rewşen jî pêşkêş kirine. Piştî wê bijîşk ji min re got rewşa gewriya te nebaşe û axaftin bikêrî te nayê. Êdî min pêşinyar kir ku bibin berpirsê pirtûkxaneya Dibistana Şehîd Yûsiv Elezemê û Şehîd Şervîn, du salan min ew bar girt ser milê xwe. Her wiha Peymangeha Bilind a Huner hat vekirin û pêşinyar hat kirin ku ez cihê xwe di rêveberiya wê de bigrim. Piştî xewna min a yekem ku saziya ziman hat vekirin ev xewna min ya duyeme ku pêk tê. Peymangihek bi vî rengî li Rojavayê Kurdistanê vebû, têde giyanê kurdewarî, çand û hunera kurdî ya resen jî tên dayîn. Her wiha ev 3 salên min in ku ez di Radiyoya Dicle de bernameya siyasî a bi navê Peyve Rast pêşkêş dikim. Du berhemên min jî hen yek bi navê 'Roj' a din jî bi navê 'Xwedawendên Bedewiyê' ye."

# Bi tabloyên neqşkirî, berhemên bi xweşikbûnê tijî ne diafrînin

**Esma Miştefa/Qamişlo**

**Jinên xebatkar, hilberîner û afrîner li ber hemû astengiyên jiyan û civakê, tenê pêşxistina kesayetên xwe armanc kirine. Razî û Sûltan jinên kurd ku bi jêhatiyên kesayetî berhemên xweşik bi destên xwe amede dikin.**

Jinên xwedî helwest û hezkarên keddayînê ne, hebûna xwe bi rengê ku ew xwe tê de dibînin di nava dîrokê de zindî dihêlin. Xweşikbûna raman û fikrên xwe bi terzekî ku ew bêne hezikirin û her mayînde bimînin; amede dikin û dibe çandek a berhemên ku bi kedê bê neqişandin diafrînin.

Dîroka jina kurd de bîrwariyek ji berhemên ku bi destan dihatin afirandin û çêkirin heye. Ev yek weke çandeke jina kurd e û bi amedekirina van berheman dema xwe derbas dikir. Dibe ku bi demê re ev yek kêm bûbe, lê nehatiye ji bîr kirin. Ev ye jî bi destê jina kurd xwe zindî dihêle. Razî û Sultan her du jinên kurd ku li Bajarê Qamişoyê jiyan dikin. berhemên karên destan yê ku xwe disipêre çanda jina kurd, dineqşînin û weke tablo pêşkêş dikin.

### Çîroka Razî a ku bi çêkirina berhemên destan li hember nexweşiyê bi ser ketiye

Razî silêman 43 ji serê kaniyê ye û dayîka 4 zaroka ye. Razî Li ser qumaş (Caw) bi tayên reng û reng hestên xwe dineqşîne. Ev çûre ji neqşan herêma Efrînê bi navê (Qenewîç) bi lêv dike û di piraniya herêman de weke Neqiş tê gotin.

Razî dema zarok bû li ser destê dayîka xwe fêrî neqşandinê bûye, lê piştî ku zewicî nêzî 20 sala ye ev kar nekiriye. Di balkêşiya çîroka Razî de ku ew di demên dawiyê de bi nexweşiya Penceşêrê ket, piştî ku nexweş bû wê hîs kir ku divê li hember vê nexweşiyê li ber xwe bide û hîs neke ku nexweşî li ser wê serwer e. Ji lewra piştî 20 salan Razî vegeriya çêkirina neqşkirina li ser caw. Van berhemên ku şopeke xwe di dîroka kurdan de hêla ye, bi awayekî ku dike taplo amede dike. Razî dibêje ku ew dike tablo da ku xira nebin û nerizin.

### 'Divê çanda dîrokî neyê ji bîr kirin'

Razî bi piştgiriya xwîşka xwe a biçûk di Festîvala "Wêje û Hure a jin" bi 32 tabloyan beşdar bûbû. Razî wiha di serpêhatiya xwe de dibêje: "Min bi mijûlbûn û çêkirina berhemên destan, êşa nexweşiya xwe ji bîr kir û ez hîs dikim ku ez her roj tiştekî nû diafrînin, bi vî awayî ez gelekî kêfxweş dibin. Da ku ev çanda kevnar ji bîr nebe, ez niha her du keçên xwe fêrî vê yekê dikim û divê ker berhem û çanda xwe a dîrokî fêr bibe û ji bîr neke".



**Razî Silêman**



**Sultan Osman**

### Çîroka Sultan neqşên balkêş bi awayekî nûjen amede dike

Sultana Osman 32 ji bajarê Qamişlo ye û dayîka sê zaroka ye. 3 salin dest bi xebatê xwe kiriye. Sultan bi awayekî nûjen, modern tabloyên li ser neqişkirî amede dike. Ew jî li ser qumaş gelek tiştan dineqşîne û didrû. Weke wêneyên ji bo zaroan, yên xwezayê, bîranîn û hwd bi rengekî gelek balkêş û kişîner amede dike.

Sultan ne ji demeke dirêj de dest bi vê xebatê kiruye, da zanîn ku ew bû 3 salin vî karî dike, lê bi awayekî herî xweşik vê yekê berhemdar dike. her wiha destnîşan kir ku karê wê zehmete lê heqdesta wê ne zêde ye. û ji aliyê civakê vet ê hez kirin.

Sultan di dawiyê de wiha dibêje: "Divê her jinek xwedî proje û xebatekî be, her çiqas ev piroje biçûk be jî lê dikare bi demê re bibe pirojeya herî mezin û binav û deng bibe. Hêviya ew e ku her jinek bibe xwedî xebatekî tayebt û bi hêza xwe bawer be".

# ‘Em heya dawiyê piştgiriya banga Rêber Apo dikin’

Welatiyên bajarê Qamişlo anîn ziman ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo mercê bingehîn e ji bo pêkanîna aştiyeke mayinde û wiha gotin: “Heta ku banga aştiyê bibe pratîk, em ê têkoşînê dewam bikin’

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Tevî ku Rêberê Gelan Abdullah Ocalan di 27’ê Sibatê de bangeke dîrokî ji bo aştiyeke mind û çareseriya doza gelê kurd û tevahiya gelên herêmê kir, lê heta niha dewleta Tirk a dagirker tu gav navêtin û êrişên wê berdewamin. Derbarê mijarê de welatiyên bajarê Qamişlo Fadiya Silêman û Ebdulkerîm Ebdo ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Neheqîq li ser Rêber Apo heye’**

Welatiya bi navê Fadiya Silêman ku ji bajarê Qamişlo ye da zanîn ku cîhan bi giştî dizane ku li hemberî Rêber Apo sûcekî dijmirovî tê meşandin û wiha got: “Êrişên dagirkeriya dewleta Tirk li ser Kurdan berdewame, bi êrişên xwe re jî dagirkerî sîstema işkence û qirkirinê jî dewam dike. Ev tecrîda ku li ser Rêber Apo tê kirin zordariyek mezine û nayê qebûlkirin. Her kes pêwîste xwedî maf be, lê mafê gelê kurd hatiye desteserkirin, dewleta Tirk hertim êrişên xwe li ser gelê kurd dike û hewil dide ku mafê gelê kurd bê windakirin. Rêber Apo ji bo bidestxistina mafê gelê kurd û pêkanîna aşitiyê bangeke dîrokî kir, lê dewleta Tirk a dagirker tu gavên berbiçav hî jî navêtine û êrişên xwe dewam dike. Em weke gelê kurd û weke dayik soza me ew e ku em ê têkoşîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dewam bikin û tekez wê Rêber Apo fîzîkî azad bibe. Em ê heta dawiyê li ber xwe bidin û banga Rêber Apo bi ser bixin.”



Fadiya Silêman



Ebdulkerîm Ebdo

**‘Bê azadiya fîzîkî a Rêber Apo aşitî pêk nayê’**

Welatiyê bi navê Ebdulkerîm Ebdo jî anî ziman ku ew piştgiriyê didin pêvajoya aştiyê ku Rêber Apo ji bo têkoşînê dide meşandin û wiha got: “Bê azadiya Rêber Apo aşitî pêk nayê. Pêwîst e hêzên navneteweyî bi hemû hêza xwe piştgiriya pêvajoyê bikin. Da ku aştî li tevahî Rojhilata Navîn pêk were. Em ê heta dawiyê xeta Rêbertî biparêzin û xeta aşitî û demokratiyê jî biparêzin.”



## “Kê me bixapîne ew ne ji me ye”

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Rojekî Pêxemberê me silavê Xwedê lêbe, li bazarê digere, kesekî ku genim difroşe, dere ser dezgeha wî: Destê xwe dike nava genim, dibîne ku genimê serî zuhaye û genimê binî şil e. Li ser vê rewşê, ji genimfiroş dipirse, çima genimê binî şil e? Genimfroş bersiva Pêxember dide û dibêje; ey Pêxemberê Xwedê, baranê ew şil kiriye: Ma tu çima genimê şil li jorê nîşan nadî û vedişêrî? Pêxember va gotina xweya dîrokî, ji bo vê kiryarê dibêje: „Kê me bixapîne ew ne ji meye“. (Muslîm Îman 164) Ev gotin exlaqê pêxemberê me yê bilind, dide nîşandan. Pîvanên mirovahî û yê olî jî di vê nêzîkbûnê de zelal û eşkere dibin. Ew exlaqê Pêxember li kûderêye û çima kes ji me li pey vî exlaqî naçe? Piştî koça Pêxember, piraniya misilmanan tenê desthilat ji xwe re kirin armanca sereke.
Di desthilatê de jî tenê derew û xapandin cî bi cîh kirin. Mixabin exlaqê Pêxember di nava civaka misilmanan de xuya nake.
Dewleta Tirk ku dibêjin em sedî not û neh misilmanin û em doza Pêxember dişopînin, lê ji exlaqê pêxember pir dûrin. Rojane ser navê Pêxember gotinan dikin, rojbûna wî pîroz dikin, lê li exlaqê Pêxemberê me xwedî dernakevin. Li Amedê binavê evîndarên Pêxember mîtîng û bernameyan saz dikin, lê ji exlaqê Pêxember bêparin. Berovajî exlaqê Pêxember yê giranbuha; ji bo pêxember bifroşin û pê nezanan bixapînin van bernameyan saz dikin.
Ev kesên dibêjin em evîndarê Pêxemberin, diyanet û hemû cemaatên li dewleta Tirkan, ne ji bo exlaqê Pêxember pêk bînin van karan dikin! Ji bo ev dewleta hov û qatil li ser piya bimîne û zilma xwe berdewam bike, van organizasyonan bi navê Pêxember pêktînin.
Miletê meyê Kurd; ji bo zimanê xwe, namûsa xwe, welatê xwe, şerefa xwe û mafên xweyê xwezayî û îslamî têdikoşe, ev cemaat û cemîyetên bi navê îslamê û Pêxember xuya dikin, ji bo xapandina misilmanên Kurd tevdigerin. Tirk wek serjimêr ji Kurdan kêmtirin û ji asya navîn hatine welatê me, bi darê zorê li xaka me bi cîh bune. Ji ber bi zulmê dest danîne ser erdê me, hergav dibêjin em birayên hevdû yên misilmanin! Ma bira, çawa bira dixapîne?
Xutbeyan bi zimanê Rûsî û zimanên curbecur didin xwendin, lê bi zimanê Kurdî qedexe dikin. Îsal bîst û pênc hezar memosta hatine cîbicî kirin, ji wan tenê şeş Memosta ji bo zimanê Kurdî hatine veqetandin.
Di nava paytexta Kurdan de, bi navê Pêxember çalekiyan pêk tînin, behsa Hemasê û hemû cîhanê dikin, lê behsa Kurdên mafdar nakin. Em bi çavê serê xwe dibînin, pesnê Pêxember ji bo xapandin û mmeta wî pêktînin. Gelo ma ji vê sosretê mezintir, sosret hene? Pêxemberê ku ji bo xapadina bazirganekê, genimê şil weke genimê zuha difroşe xelkê dibêje:“kesê me bi xapîne ew ne ji me ye“. Ka ji bo van minafiqan wê pêxemberê me, çi bigotana? Ez matmayî dimînim: Kesê bi navê Xwedê, Pêxember, Nimêjê, Rojiyê, Hecê, Zekatê me dixapînin, çawa dibin ji me? Bi navê vî pêxemberê xwedan exlaqê bilind: Welatê me ji me girtin, zimanê me qedexe kirin, çanda me tune kirin, ser erd û bin erdê me talan kirin. Têkoşerên Kurd dibêjin werin em aşitiyê pêk bînin; ew vê biryara pîroz jî, weke derfeta xapandina Kurdan bikar tînin.
“Kê me bixapîne ew ne ji me ye”. Heta ev xapandin berdewam be, ne em ji wanin, ne jî ew ji me ne.

# ‘Enerjiya rojê bi hevkariya şîniyên gundê Sihil hat danîn’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Mihemd Salih Yûsif Yûsif diyar kir ku ji ber kêmasiyên sotemenî û elektrîkê şîniyên gundê Sihil enrjiya rojê ji bîra avê re danîn. Herwiha Yûsiv tekez kir ku ev piroje bi hevkariya gundiyan pêk hat, wê rewşa ava gund baştir bibe, lê divê şîniyên gund avê li gorî pêdiviya xwe bi kar bînin.**

Ji ber sûdmendiya ku ji enerjiya rojê tê wergirtin, hem jî kêmbûna sotemeniya ku bi neyînî zererê dide jîngehê, piraniya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstema enerjiya rojê ji bo xwe weke sîstemeke guncav dibînin. Êdî bijarteya şîneyên herêmê di hemû qadan de çi ji bo bidestxistina elektrîka mal, kargeh, bîrên avê yên ji bo çandiniyê û hwd… enerjiya rojê ye.
Gundê Sihil yê dikeve başûr-rojavayî bajarê Tirbespiyê ku yek ji gundên ku enerjiya rojê ji bo bîra avê ya ku dikeve xizmeta şîniyan, lê hatiye pêkanîn. Ev gav jî bi awayekî hevbeş û li ser hîmê sîstema koperatîf û xwerêvebirinê hatiye avêtin ku şîniyên gund bi hev re enerjiya rojê ji bo bîra avê ya giştî danîne.
Derbarê pêkanîna projeya enerjiya rojê ji bo bîra avê, endamê komîteya projeyê Mihemd Salih Yûsif ji rojnameya me re axivî.

**‘Ji ber kêmasiyên sotemeniyê û elektrîkê enerjiya rojê hat danîn’**

Yûsif diyar kir ku ji ber kêmasiyên sotemenî û elektrîkê şîniyên gundê Sihil enrjiya rojê ji bîra avê danîn û wiha got: “Aloziya elektrîkê ne ya gundê me tenê ye, lê ya herêmê tevî ye, piştî aloziya Sûriyê alozî ketin rewşa elktrîk û sotemeniyê. Lewma jî şîniyên gundê Sihil bi rengê hevkarî û koperatîfê jenetorek ji bo bîra avê ya gund kirîn, hem jî çi hewcedariyên sotemeniyê û elektrîkê, çaksazkirina alavên jenetor û xetasê av peyda kirin. Lê piştî hedefgirtina hemû stasiyonên elektrîk, sotemeniyê û navendên xizmetguzariyê yên herêmê ji hêla dewleta Tirk ve, êdî sotemeniya ku ji bo jenetor kêm bû û elktrîk bi carekê nema hat. Lewma jî ji ber kêmbûna sotemendiyê û qutkirina elektrîkê em neçar bûn ku sîstema elktrîkê ya jenetor bi sîstema enerjiya rojê veguherînin. Me komîteyek ji bo meşandina kar û xebatên projeyê ava kir, lêkolîn û lêpirsîn li ser awayê pêkanîna wê hatin kirin. Herwiha me li ser malpera gund a facebookê ragihand ku em ê dest bi xebateke wiha bikin. Weke insiyatîfê hat belavkirin û li ser esasê wê piraniya gundiyan pere dan, hem kesên ji derveyî welat û hem jî kesên di gund de, herwiha hin kesên ne ji gund jî bûn alîkar ji bo projeyê.

**‘10 hezar dolar ji bo projeya enerjiya rojê hat xerçkirin’**

Mihemed Salih eşkere kir ku bêhtirî 10 hezar dolar ji bo projeyê hat xerçkirin û wiha domand: “Ji ber ku av tiştekî sereke ye di jiyana me de û hewcedariyeke mezin pê heye, me dest bi projeya enerjiya rojê kir. Hejmara malên di gund de bêtirî 120 malî ye, bîreke tenê ya giştî heye, ev bîr jî behrî ye. Salên bûrî di werzê havînê de şîniyên gund rastî astengiyan dihatin, her roj du caran tenê av ji bo wan dihat dayîn. Lê piştî danîna sîstema enerjiya rojê wê 3 caran av ji gundiyan re bê dayîn. Piştî dirêjahiya mehekê ji xebata li ser pêkanîna projeya enerjiyê, ev pirojeya me hat amadekirin. Destpêkê 64 lewheyên erjiyê û ji wan re çar stûn hatin bicihkirin,ev stûn zivrok in, ango di cihê xwe de tên gerandin, roj li kû be wê berê lewheyên enerjiyê li rojê be. Enerjiya rojê ya ji bo bîrên avê li gundên derdora gundê me hene, lê ne wiha gerok in, ji ber vê yekê jî mesrefa wê bilindtir bû, meserfa wê jî bêtirî 10 hezar dolarên Amerîkî bû.”



**‘Divê şîniyên Sihil avê li gorî hewcedariya xwe serf bikin’**

Yûsiv tekez kir ku wê rewşa ava gund wê baştir bibe, lê pêwîst e şîniyên gund li gorî pêdiviya xwe avê bi kar bînin û ava xwe biparêzin û wiha axivî: “Weke em dibînin ku rewşa avhewayê ya herêma me tê guhertin, rêjeya barîna baranê kêm bûye û herêm ber bi zuhabûnê ve diçe. Lewma jî divê şîniyên gundê Sihil ji bo ava xwe baldar bin û li gorî pêdiviya xwe avê bi kar bînin. Em dizanin li gundan şînahî û çandinî tiştekî girîng e, piraniya xelkê şînahiyê di hewşên xwe de diçînin. Pêwîst e em hemû li gorî hewcedariyên xwe hin cureyên şînahiyê biçînin û li ava xwe miqate bin, ne ku em bibêjin enrjiya rojê ji bo bîra avê hat pêkanîn û em hemû baxçeyên xwe bikin şînahî û avê bêhtir bi kar bînin. Em hemû berpirsiyar in ku ava xwe biparêzin û li gorî xwe xerç bikin da ku di siberojê de astengî çênebin. Li aliyekî din, ji ber ku ev sîstema enerjiya rojê li hin gundên derdora me hat pêkanîn û ji ber ku ev sîstem riya herî baş e ku were bikaranîn em bang dikin ku hemû kes çi li gundan an jî li bajaran enerjiya rojê ji bo hemû warên jiyanî bi kar bînin. Sîstema enerjiya rojê weke sîstema jenetoran zererê li jîngehê û ekolojiyê nake, lê belê jîngehê diparêze.”

**‘Divê Desteya Sotemeniyê mazotê ji jenetor qut neke’**

Endamê komîteya karûbarên projeya enerjiya rojê ya bîra gund Mihemd Salih Yûsif da zanîn ku jenetorê bîrê wê li cihê xwe bimîne, divê Desteya Sotemeniyê ya Tirbespiyê mazotê ji bo jenetor qut neke û wiha bi lêv kir: “Em dizanin ku vaye enerjiya rojê ji bo bîra gundê me hat danîn, ev sîstem ji ber kêmbûna sotemeniyê hat pêkanîn. Lê ev nayê wê wateyê ku em ê nema jenetorên elektrîkê bi kar bînin, lê belê jenetor wê li cihê xwe bimîne, wê jenetorên me weke bijarteye duyem piştî enerjiya rojê di destê me de hebe. Tê gotin dema ku gundek enerjiya rojê ji bo bîran tê danîn Desteya Sotemeniyê mazotê li ser jentoran qut dike, em dibînin ku ev biriyareke şaş û milet ne pê re ye. Ji ber ku di werzê zivistanî de em ê nikaribin enerjiya rojê wekû tê xwestin bi kar bînin, lewma jî wê pêwîstiya me bi jenetorê elektrîkê hebe. Ji ber vê yekê jî pêwîst e Desteya Sotemeniyê ya Tirbespiyê mazotê ji bo jenetorê bîra ava gund qut neke, eger weke berê jî nede, banga me ew e ku di salê de sê caran mazotê ji bo jenetoran bide.”



# ‘Konferansa yekrêziya Kurdî dê bibe, bingeha kongreya netewî’

Parlementerên DEM Partî Gulcan Yigit Kaçmaz û Serhed Eren ku di şandeya hatiye Rojavayê Kurdistanê cih digirin, bilêv kirin ku konferansa yekrêziya Kurdî dê bingeha yekîtiya hemû Kurdan re bibe mînak û wiha gotin: “Konferansa yekîtiya kurdî li Rojava dê bibe, bingeha kongra netewî ya Kurdistanê”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Şandeya Partiya DEM’ê ku ji Hevseroka Partiya Herêmên Demokratîk (BDP) Keskîn Bayindir, Endamê Desteya Rêveberiya Navendî ya Partiya Wekheviya Gelan û Demokratîk (DEM) Serhat Eren, parlementerên DEM’ê Salîha Aydenîz, Gulcan Kaçmaz û Mehmet Kamaç pêk tê, 24’ê Nîsanê 2025’an de gihiştin Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Şande wê tevlî konferansa yekîtiya kurdî ku îro li Qamişlo tê lidarxistin, bibe.
Di derbarê hatina şandeya DEM Partiyê û tevlîbûna wê ya di Konferensa yekrêzîya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, parlementerên DEM Partî û endamên şandeyê Gulcan Yigit Kaçmaz û Serhed Eren ji rojnameya me re axivîn.



**‘Hatina me ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê avakirina pira yêkitiyê ye’**

Gulcan Kaçmaz diyar kir ku hatina wan ya Rojavayê Kurdistanê şikandina sînoran e û wiha got: “Destpekê me silavên gelê Bakurê Kurdistanê ji bona gelê berxwedêr û têkoşer yên Rojavayê Kurdistanê, anî. Em ji bona şahidiyê van kêliyên dîrokî yên yekrêzî û hevgirtina Kurdên Rojava bikin, em hatin, herwiha em ji bona şoreşa Rojavayê Kurdistanê û modela Rêveberiya Xweser bibînin, me ev serdan kir. Bi rastî jî em pir bi kelecan ji aliyê endamên Rêveberiya Xweser û gelê Rojavayê Kurdistanê hatin pêşwazîkirin. Em jî pir keyfxweşin ku tên axa berxwedêr û tekoşer ya Arîn û Gelhatan. Her beşek vê xakê çîrokekî wê heye, bi xwînê hatiye avdan. Ev berxwedana keç û xortên Kurdan û gelên din yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye mînak ji hemû cîhanê re. Em pir xweş hatin pêşwazîkirin û ev kelecan bû bingeh ku sînor ne astengin ku mirov bibê yek û ji hev du hez bike. Me li gel wê jî çend rêze hevdîtinên li gel endam û nûnerên Rêeveberiya Xweser yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk anîn. Ev dem kêliyên dîrokî ne bû hemû beşên Kurdistanê û ev demekê dirêje ku ji bona Rojavayê Kurdistanê hatin çûyin hatibûn qedexe kirin. Ew jî aliyekê de saya têkoşîna salan bû.”

**‘Ev konferans dê ji bona yêkreziya Bakurê Kurdistanê jî bibe bingehekê xurt’**

Gulcan ji bona hatina Rojavayê Kurdistanê kêfxweşiya xwe anî liser ziman û wiha axaftina xwe domand: “Piştî 27’ê Sibata 2025’an banga Rêber Abdullah Ocalan ya “Aşitî û Civaka Demokratîk” li Rojavayê Kurdistanê jî pêvajoyekê mezin hat destpêkirin. Dema ku Rêber Apo ev bangawazî kir, me destpêkê nekarî em bên nêrînên gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bigirin. Hevalên me yên di nava Şandeya Imralîyê de jî cihdigirin bi rastî jî pir dixwastin derbasî Rojavayê Kurdistanê bibin, lê ji ber astengî û ewlehiyê nekarîn bên wan jî slavên xwe yên taybet gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê re şandin. Lê wê carî saya têkoşîn û berxwedana gelê her çar parçê Kurdistanê û di heman demê de berxwedaniya Rêber Apo ya 27 salin li girava Imraliyê dimeşe, em îro hatin xaka Rojavayê Kurdistanê. Tevlîbûna konferansa yekrêziya Kurdî ji bona me jî ezmûneke pir giran û bûha ye. Ji ber ku beriya 100 salan dagirker û desthiladaran Kurdistan kirin 4 parçe û di navbera xwe de dabeş kirin. Ev 100 salin jî netew dewletên ku wan 4 beşên Kurdistanê zext û zordarî li ser gelê me dimeşînin. Lê hemberî dagirkeran Kurdan her berxwedanî daye meşandin û têkoşîya ye. Ji ber wê Rêber Apo dibêje “Sedsalên pêşiya me pewiste êdî bibe, sedsala Kurdan.” Em jî pêwiste weke siyasetmedar û pêşengên civakê yên kurd ev cudahiya di navbera xwe de holê rakin û her çar beşan de bibin xwediyê yek rih û yek armanc ê. Ji ber wê sedemê konferansa ku sibê tê lidarxistin pir girîng û dîrokî ye. Pêşengiya wê yêkitiyê Rojavayê Kurdistanê dike merhelekê cüda û ji ber wê ye Bakur û Rojhilatê Suriyê cihekê we yê taybet û cuda heye. Piştî evqas alozî û gengeşîyan Rojava şahidiyekî dîrokî dik e. Li ser wê bingehê jio bona yêkrêzî û yekitiya Kurdan em ê biçin her dere Kurdistanê. Di wê çarçoveyê da jî ger derfet ava bibin em ê weke desteyekê hevpar derbasî Rojhilatê Kurdistanê jî bibin. Bakurê Kurdistanê jî em ê konferansekê bi wî awayi lidarbixin. Konferansa Rojavayê Kurdistanê kaniya yekbuyina Kurdan e. Ji ber wê bangawaziya me ji bona kesayet û pêşengên Kurdistanî ew e ku; partiya me çi be, fikra me çi be bila ew be, lê pêwîste em weke sîyasetmedarên Kurd ji bona yek Kurdistan xebat bikin.”

**‘Ev konferansa yekrêzî yê, bi saya têkoşîna 27 salan ya li Îmraliyê ye’**

Gulcan Kaçmaz giringiya Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan di pêvajoya de bibîrxist û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Ev nêzî 4 sal bûn li gel Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan bi ti awahî hevdîtin ne dihatin kirin. Lê piştî axaftina serokê Partiya Netewperest ya Tevger (MHP) Dewlet Bahçelî û hevdîtinên li gel DEM partîyê pêvajo veguharande serdemekê nû. Dema ku Rêber Apo li gel biraziya xwe û parlementerê DEM Partî yê Rihayê Omer Ocalan re jî hevdîtin kIr û got “Pêwiste ev pirsgrêk bi avayekî demokratik bê çareserkirin.” Beriya niha sala 1993’an de dîsa Rêber Apo ev tişt digotin. Berxwedana Rêber Apo ya girava Imralîyê di odeya 10 metre de bi rastî jî têkoşînekê bêhempa bû. Ger ev hevdîtin destpêkiribin û em qala yêkrêziyê dikin, ev saya berxwedana Rêberê gelan Rêber Apo û têkoşîna gelê her çar parçeyên Kurdistanê ye. Me di encamê li wan serlêdanan de gelek cîvîn çêkirin, ji bona em ev pêvajoyê baş bidin fêmkirin. Ji ber ku Rêber Apo, bi wê bangê listîkên netew dewletên hegemon hemû xerab û serûbinê hevkir. Pêwiste paradigma Netewên Demokratîk em bikin modelekê cîhanî û ji ber wê ye Rêber Apo Rêberê Netewî ye. Ji bona azadiya fizîkî ya Rêber Apo pêk bê, em weke siyasetmedarê Bakurê Kurdistanê em ê he dawiyê xebatên xwe bimeşînin.”



Gulcan Kaçmaz



Serhed Eren

**‘Konferansa yêkrezî dê bibe modela yekbûyîna hemû Kurdên cîhanê’**

Endamê şandeya DEM Partîyê, parlementerê Amedê Serhed Eren jî anî li ser ziman ku hatina wan ya Rojava, hêviya rakirina sînorên her çar parça ne û wiha axaftina xwe domand: “Piştî banga 27’ê Sibatê tevahiya Kurdistanê bi banga Rêber Apo kete merheleyekê nû. Rêber Apo ji bona çareseriya pirsgirêka Kurd paradigmayekê nû xiste pêşiya me. Me gelek partî û rêxistinên Tirkiyê ji dervî Iyî Partî hemû aliyan re hevdîtin kir. CHP jî pêşniyar kir ku raste rast di nav wê pêvajoyê de cih bigire û piştgiriya xwe dan xuyakirin. Rêber Abdullah Ocalan li ser xala ku bi hemû gelan û derdoran re peywendî bê danîn de li ser sekinî bû. Daxwaz kiribû ku peywendiyên li Başûrê Kurdistanê û derdorên wê re bên xurtkirin. Li ser bingeha pêşniyar û nêrînên Rêber Apo 3 şandeyên me yên DEM Partî yê dîrokên cüda de derbasî Başûrê Kurdistanê bûn. Em ev 3 roj bûn li Başûrê Kurdistanê bûn, me gelek partî û dezgehên siyasî û rewşenbîrên heremê li ser pêvajoyê hevdîtin pêk anî. Mijara hevdîtinên me li ser banga Rêber Apo ya “Banga aşitî û civaka demokratik” bûn. Li ser wê bingehê em derbasî Rojavayê Kurdistanê jî bûn. Em ê piştî li wir gor derfetan derbasî Rojhilatê Kurdistanê jî bibin. Ev piştî şoreşa Rojavayê Kurdistanê ambargoyekê mezin li ser heremê hebû, hatin çûyin hatibû qedexekirin. Em jî wê kêfxweşî û şanaziyê jiyan dikin ku rojekê wiha dîrokî ya yekitiya Kurdî de, derbasî li wir bûn. Rojavayê Kurdistanê war û keleha berxwedanê ye. Cihê pêxistina meşaleya azadi yê ye. Ji bona hemû cîhanê Bakur û Rojhilatê Sûriyê nîşaneya têkoşînê ye. Her çar parçeyên Kurdistanê pêşeroja wan bi hevra girêdayi ye. Sedsala 21’emîn de jî ti netew dewletên ku Kur dli wir jiyan dikin demokrasi ava nekirin e û mafê gelê Kurd nedan e wan. Sedsala ku em tê de jiyan dikin da xuyakirin ku pêwist e demidest mafê kurdan bê dayin û bibin xwedî statû. Piştî şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi saya têkoşîna Kurdan cîhanê hemû gelên bindest naskirin. Ger ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibe xwedî statû, dê bandore xwe Rojhilata Navîn tevahî bike. Em ê tevlî konferansa yekrêzîya Kurd ya netewî bibin, ev dê bib e bingeha avakirina Kurdistanekê xweser û demokratîk. Xebatên yêkitiya Kurdan ya li Rojavayê Kurdistanê, bib e bingeha lidarxistina kongreya netewî ya tevahî kurdistaniyan.”

# Bermahiyên şer li ser gelê Sûriyê metirsiyeke mezin daye avakirin

Bermahiyên şer jiyana sivîlên Sûriyê xistiye metirsiyeke mezin de. Li gorî belgekirina Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî piştî rûxandina rejîma Baas û heya niha li Sûriyê 875 sivîl ji ber bermahiyên şer hatine kuştin û birîndarkirin. Di nava vê mehê de jî 67 sivîl hatin kuştin û birîndarkirin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**




Piştî hilweşandina rejîma Baas di 8'ê Berfanbara 2024'an de, Sûriyê ji ber şer û pevçûnên ku 14 salan dewam kirin di nava hilweşîneke mezin de mabû. Şer ne tenê bandora xwe li binezasiya welat kir, lê vî şerî giyanê mirovan jî reş û tarî kir. Ji ber bermahiyên şer ên wekî bombe, rokêt û çekên ne teqyayî gelek kesan canê xwe ji dest dan û jimareke mezin jî perçeyên laşê xwe winda kirine. Ev bermahiyên çekan li pêşiya vegera sivîlan ji bo li ser xaka xwe bû asteng. Ji ber şer gelek mal û milkên welatiyan wêran bû û bermahiyên malan li her deverê belav e. Ji ber wêranbûna xaniyan bi dehan gund, bajar û bajarok xelkên wê nikare vegerin malê xwe. Herwiha li gorî belgekirina Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî, piştî rûxandina rejîma Baasê li Sûriyê 875 sivîl ji ber mayîn û bermahiyên şer hatine kuştin û birîndarkirin.

### Metirsiya bermahiyên şer li Sûriyê dewam e

Bermahiyên şer li Sûriyê berdewam in, gelek bermahî jî heta niha nehatine teqandin, ev jî metisiyeke mezin li ser jiyana sivîlên ku li seranserî Sûriyê jiyan dikin, heye. Bermahiyên şer li hemû deverên ku di van salên dawî de bûne şahidê operasyonên leşkerî belav bûne. Tevî hewcedariya lezgîn a rakirina van bermahiyan jî, lê hîna hewldanên pêwîst nehatine kirin. Rayedarên herêmî û rêxistinên mirovahî jî heta niha gavên cidî ji bo parastina sivîlan neavêtine. Lê ev yek bi tevgereke lezgîna ya paqijkirina bermahiyan heye, di heman demê de pêwîst e hişyarî ji gel re jî bê kirin.

### Sejmariya kuştin û birîndarbûna sivîlan bi bermahiyên şer piştî rûxandina Baasê

Di vê çarçoveyê de, Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî kuştin û birîndarbûna 875 sivîlan, di nav wan de jin û zarok, li deverên cûda ên Sûriyê ji dema hilweşandina rejîma Baas ve belgeh kir.

Hejmara sivîlên ku di encama bermahiyên şer piştî rûxana rejîmê li parêzgehên cûda yên Sûriyê hatin kuştin gihişt 423 sivîlan ji wan 311 mêr, 88 zarok û 24 jin. 452 kesên din jî birîndar bûne ku 207 jê zarok û 9 jê jin in. Ev li gorî cihê hebûna hêzan hatiye belavkirin.

Li herêmên desthilata Şamê: 341 kes hatin kuştin, di nav wan de 72 zarok û 18 jin, ji wan 8 ku di dema komkirina dobelanan de hatin kuştin, di nav wan de jinek û zarokek bû. 324 kes jî di nav de 145 zarok û 7 jin birîndar bûn.

Li herêma Rêveberiya Xweser: 22 kes hatin kuştin, ji wan 9 zarok û 3 jin. 40 kesên din jî birîndar bûn, ji wan 31 zarok bûn.

Li herêmên di bin koîn çete yên girêdayî dewlaeta Tirk de: 60 kes hatin kuştin ku ji wan 7 zarok û 3 jin bûn. 88 kesên din jî birîndar bûn, ji wan 31 zarok û 2 jin bûn.

### Di nava meha Nîsanê de 67 birîndar û kuştî hatin belgekirin

Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî di heyama 16 rojan de, 67 birîndar û kuştiyên van bermahiyan hatin belgekirin ku di nava wan de 11 zarok bûn.

### Serjmariya qurbaniyên teqandina bermahiyên şer li Sûriyê

Li herêmên desthilata Şamê: 19 kuştî ku 7 jê zarok in, herwiha 36 sivîl birîndar bûn, ji wan jî 11 zarok bû.

Li deverên di bin kontrola komên girêdayî dagirkeriya Tirk de: 7 sivîl birîndar bûn.

Li herêma Rêveberiya Xweser: Welatiyek û zarokek hatin kuştin, 3 zarok jî birîndar bûn.

- Di 1'ê Nîsanê de 6 kes li bajarokê Ebû Qelel a gundewarê Minbicê birîndar bûn.

-Di 2' Nîsanê de 4 kes li gundewarê Rojhilatê Himsê birîndar bûn.

-Di 3'ê Nîsanê de sivîlek bi giranî li daristanên li derdor gundê El-enkar yê gundewarê Hema yê, sivîlekî din jî li gundê Enbah yê Rojava Heqil Elsewra yê gundewarê Rojavayê Reqayê birîndar bibûn. Di rûdan bûyereke din de zarokeke bi temenê 12 salî li Belke Telmins a gundewarê Idlib jiyana xwe ji dest da. Sivîleke din li Kfrinibil a gundewarê Idlibê bi giranî birîndar bibû. Herwiha 3 kes ji malbatekê li Başûrê Dêra Zorê jiyana xwe ji dest dan. 2 kes jî li navçeya El-Şola ya Başûrê Dêra Zorê birîndar bûn.

-Di 5'ê Nîsanê sivîlek li gundê Fehîl ê Başûrê bajarokê Sincar a gundewarê Idilbê jiyana xwe ji dest da. 4 sivîl jî li Başûrê Hemayê birîndar bû, di bûyereke din jî sivîlek li gundewarê Hemayê jiyana xwe ji dest da.

-Di 6'ê Nîsanê de sivîlek li gundewarê Dêra Zorê jiyana xwe ji dest da.

Di 7'ê Nîsanê de zarokek ji ber teqîna mayînekê di hundir mala xwe li Idlibê, zarokekî din jî li gundewarê Rojavayê Idilibê birîndar bû. Zarokekî din jî li Başûr Idilibê birîndar bibû. 2 kes jî li çola El-qoriye ya gundewarê Dêra Zorê ya girêdayî Hikûmeta Şamê birîndar bibûn.

-Di 9'ê Nîsanê de 2 sivîl li bajarokê Mearet El-neisan a gundewarê Idilibê, sivîlekî din jî li çola El-qoriye ya gundewarê Rojhilatê Dêra Zorê birîndar bibûn. Li gundê El-kerame ya Başûrê Hesekê jî zaroke birîndar û yek jî jiyana xwe ji dest da. Li gundê Hisêniyê yê Bakurê Dêra Zorê sivîlek jiyana xwe ji dest da.

-Di 10'ê Nîsanê de sivîlek li gundewarê Başûrê Reqayê jiyana xwe ji dest da. Herwiha sivîleke din li gundê El-haco ya nêzî riya M4 li Bakurê Reqayê birîndar bibû.

-Di 11'ê Nîsanê de sivîlek li gundewarê Idilibê jiyana xwe ji dest da û yek jî birîndar bibû. 2 sivîl jî ku yek jê li bajarokê Hemîme ya çola Dêra Zorê yê din jî li nêzî nexweşxaneya Dil a bajarê Dêra Zorê birîndar bû. Sivîlekî din jî li bajarokê El-Teybe yê Rojhilatê gundewarê Himsê birîndar bû. Herwiha li Rojhilatê Reqayê sivîlek birîndar bû û yek jî jiyana xwe ji dest da.

-Di 12'ê Nîsanê de sivîlek li nêzî sînorê Sûriyê û Iraqê jiyana xwe ji dest da.

-Di 13'ê Nîsanê de li gundewarên Rojhilatê Dêra Zorê 2 zarok û di bûyereke din de jî 2 zarok din li ser riya gundewarekî Rojhilatê Idilibê bi giranî birîndar bibûn.

-Di 14'ê Nîsanê de li bajarokê Ciba ya gundewarê Qinêtra zarokekî ku di 7'ê Nîsanê de birîndar bibû, jiyana xwe ji dest da. Herwiha zarokeke din a gundewarê Hemayê jiyana xwe ji dest da. Li Başûrê Idilibê jî 5 zarok birîndar bibûn.

-Di 15'ê Nîsanê de li nêzî bajarokê Tesîl yê Rojavayê Derayê 4 sivîl jiyana xwe ji dest dan ji wan 3 zarok bûn. Herwiha li Rojavayê Dêraz Zorê sivîlek jiyana xwe ji dest da û yek jî birîndar bibû.

-Di 16'ê Nîsanê de li gundê El-Dibşiyê yê Rojhilatê gundewarê Idlibê zarokeke jiyan xwe ji dest da.



## Yekrêziya aliyên Siyasî li Rojava

**Mihemed Seydî**

Ev serê zêdetirî 12 salaye ku behsa yekrêziya navmala Kurdî tê kirin û hewldan çêdibin ku alî werin li hev bicivin, lê nedibû. Sedemên vê yekê jî gelek bûn yên sereke jî ew bûn ku destwerdanên Hewlêr û dewleta Tirk bûn. Bi riya van aliyan zext li Rêveberiya Rojava dihat kirin û astengî li pêşiya pêşveçûnên ji bo doza Kurdî dihatin çêkirin. Her çiqasî vê rewşê dirêj jî kir, lê ji ber pêşveçûnên cîhanî û yên herêmî, alî mecbûr man li hev bicivin. Erê, lê çawa Hewlêr û dewleta Tirk ev yek qebûl kir?

Dema em bala xwe bidin pêvajoya dema derbasbûyî, em dibînin ku çawa guhertinên li Rojhilata Navîn bandor li ser tevgera Kurdî jî kirin. Bi şerê li Xezayê re Israîl ket tevgerê, bi kuştina sekreterê Hizbûlahê Hesen Nesrelah re guhertinan dest pê kir û bi ketina Rêjîma Baas li Şamê û reva Beşar El-Esed re, rewş zelaltir bû. Bi vê rewşê re dewleta Tirk hîn zêde veciniqî û tirsiya ku Îsraîl heta sînorên wê jî were. Lewma di vê pêvajoya ku em behsa wê dikin re, serokê Partiya MHP Dewlet Bahçelî çend cara bang kir ku bila Ocalan were li Meclisa Tirkiyê biaxive û ew mesela xwe û Kurdan çareser bikin. Ji ber wan dît ku kî bi Kurdan re li hev bike, ew ê di herêmê de lingê xwe baş bi cih bike û were qebûlkirin. Rêber Apo Ku bi salaye di nava girava Îmraliyê de girtiye, bangeke dîrokî kir û ragihand ku pêvajo guheriye û divê Kurd jî li gorî wê xwe bi rêxistin bikin û xwe bugherin. Rêber Apo berî her tiştî ji bo Rojava derxe saxlemiyê, hemû alî xistin bin barê vê dozê û di encamê de Roja 24.4.2025 de aliyên Kurd li hev kom bûn.

Ev Konferans an Kongre ku li bajarê Qamişlo tê lidarxistin, ne tenê ji bo Rojava, lê ji bo parçeyên din jî girîng e. Ji ber lidarxistina vê civînê û serkeftina wê rewabûna Rêveberiya xweser zêdetir dike û hemû alî ji niha û şûn de mejbûrin destekê bidin. Ev yek jî bi saya rêber Apo pêk tê ku karîbû astengiyan ji holê rake.

Qasî lidarxistina vê civînê li Qamişlo di nava aliyên siyasî yên Rojava de girîng e, ewqasî jî amadebûna şandeyeke ji DEM-partiyê ji bakurê Kurdistanê û hin şandeyan ji başûrê Kurdistanê girîng e. Ji ber ya ku rêber Apo ji vê armanc dike ew e ku Kongreya Netewî ya Kurdistanê were lidarxistin û lêvegereke giştî ya Kurdan çêbibe.

Her çiqasî hewldanên berê ji ber zextên dewleta Tirk û hin hêzên Rojavayî li ser Hewlêrê nehişt Kongra Netewî were lidarxistin, lê niha hevsengî guherîn û alî mecbûrin yekbûna Kurdan qebûl bikin. Dewleta Tirk ya Ku bi her awayî li pey qirkirina Kurdan e, wer xuyaye gihiştiye wê fêmkirinê ku ger bi Kurdan re li hev neke, aliyên ku pêre li hev bikin gelekin û wê demê ya zirarê bibîne ew ê dewleta Tirk be. Ji ber vê yekê ye em dibînin danûstandin bi rêber Apo re li ser doza kurdan li herçar parçeyên Kurdistanê tê kirin.

Herwiha xuyaye şertê rêber Apo yê destpêkê ji bo dewleta Tirk jî ewe ku astengiya li pêşiya Kongreyekê Netewî çê nekin da ev pêvajo here serî. Bi vê yekê re jî Hewlêr xist bin barê vê doza Kurdî û pêre jî aliyên din.



# Amerîka û Çîn li dahola şerê aborî dixin!

Li ser bingeha sîstema kapîtalîst a netew-dewletê û aboriya serwer Amerîka û Çînê berê bazirganiya cîhanê didin rikberiya aborî. Wekî tê destnîşankirin ji biriyarên bacan ên herdu aliyan gaveke metirsîdar e ku şerekî aborî li ser asta cîhanê derbikeve û civak jî bibe qurban jê re.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Turmp aboriya Amerîkî li pêşiya her tiştî dibîne

Bi geşedaneke ji nişka ve, şerê aborî yê cîhanî kete rojevê, ev yek jî dema ku serokê Amerîkî Donald Turmp biriyara bilindkirina rêjeya baca li ser kelûpelên Çînê, da. Rêjeya wê jî weke yekem car bû 104ji sedî. Turamp bi daxuyaneke çapemeniyê de li Koşka Spî di 9 Nîsanê de ev biriyar da, weke ku wî destnîşan kir, armanca wî ew e ku berhem, kelûpel û keda kedkarên hemwelatiyên Amerîkayê biparêze, li gorî ku wî anî ziman ew ê li pêşiya rikberî û kiriyarên Çînê yê xirab derheqê bazirganiya Amerîkayê bisekine. Lewma jî, Turamp derfet û efûkirineke demkî bi dirêjahiya 90 rojan da hevkarên abornas ku ev rêjeya bilindbûyî li ser wan nayê ferzkirin, lê Çîn ji efûkirinê bêpar e.

### Çîn biriyarên dijwar û tolhilandinê li Turamp dide

Piştî çend demjimêran ji axaftinên Turamp, hikumeta Çînê biriyarên tund û dijwar derheqê Amrîka dan û bi gotina 'Belteciya Aborî' hem jî bi binpêkirina rêgezên aboriya cîhanî biriyarên Turamp pênase kir. Di heman demê de Çînê biriyar da ku rêjeya baceyan derheqê Amerîkayê ji rêjeya 84 ji sedî ber bi 125'an ji sedî ve bilind bike. Li aliyekî din hin bertek û biriyarên tolhilandinê ji bo Amerîkayê dan. Yek ji van biriyaran rawestandina kirîna hin berhemên çandiniyê wekî fûl û garis ji Amerîkayê. Herwiha danîna qeydên zor li ser kanzayên kêmpeyda yên ku gelek amûrên teknolojî yên Amerîkî bi wan tên çêkirin. Di heman demê de vekirina dosiyayên lêpirsînê derheqê kampaniyên Amerîkî yên li Çînê hatine avakirin ev yek jî bi hinceta binpêkirina kampaniyan ji rêjeya baceyên destnîşankirî re.

### Bandora rikberiya aborî ya dualî ji hemû waran ve

Bê guman dema ku du dewletên mezin ên serweriya kapîtalîsta cîhanî dikin mîna Çîn û Amerîka û dikevin nav rikberiya aborî, helbet wê ev yek encam û bandorên girseyî li ser asta herdu aliyan a xwecihî û cîhanê bi xwe re bînin. Di serî de encam û bandor li ser Amerîka bibe. Ji van encaman ew e ku wê buhayê kelûpelan li ser welatiyan bilind bibe, pê re jî wê rêjeya baceyên tiştên ku ji Çînê derbasî Amerîka bibin, bilind bibe. Hem jî wê buhayê amûrên teknolojî, çek û alavên pîşesazî bilind bibin. Li hêleke din wê zexteke mezin li ser kampaniyên Amerîkayê bê kirin, nexasim ew kampaniyên ku hêza xwe ji amûrên Çînî werdigire. Di heman demê de wê tevgera bazarên diravî yên Amrîkayê lawaz bibe, ev yek jî çêbû û buhayê Dolarê Amreîkî li gorî EURO ber bi jêr ve çû. Ji aliyê din ve bandorekê li aboriya Çînê dike, mîna kêmbûna daxwaza kelûpelan ji derve, wê kampaniyên çînî bi rihetî nikaribin berhemên xwe bifiroşin bazarxaneya amerîkî. Lewma jî kampaniyên Çînê hewcedar dibin ku bazarên din weke Afrîka, Amerîkaya Latînî û Asiyayê bibîne û berhemên xwe bifiroşin wan. Hem jî wê berhemdayîna xwecihî ya hin kargeh û kampaniyan bihêztir bibe, bi taybet ew kargehên ku karê xwe li ser teknolojiya amerîkî didomandin.



### Wê rikberiya Amerîka û Çînê çi encaman ji bo cîhanê bîne û çareseriya wê çi ye li gorî Rêber Apo?

Bê guman siyaseta Turamp a parastina aboriya Amerîkayê wê guhertin û veguhertinên cuda ji bo aboriya cîhanî bi xwe re bîne. Hin ji van guhertinan ku wê rikberiyeke bêhempa bikeve nav aboriya welatan, hem jî wê lobî û tîmên welatan saz bibin û li dijî welatên din kar bikin da ku bibin serwer û aboriya wan welatan birûxînin. Mînak dibe ku têkiliya bazirganiyê di navbera Çîn û Rûsyayê xurtir bibe da ku herdu alî dijberiya Amerîkayê bikin û aboriya Amerkayê lawaz bikin, dibe ku Çîn riya Herîr a ji mêj ve rawestiyayî, vejîn bike û li dijî riya pirojeya aborî ya bi navê IMEC ango Xeta Hind-Rojhilata Navîn-Ewropa ya Aborî, ku Amerîka serperştiya wê dike, kar bike. Helbet wekî tê destnîşankirin ev gavên ku tên avêtin tekez e ku li ser hîmê kapîtalîstiya nûjen tên pêkanîn, rikberiya Çînê û Amerîka du hêzên sermeyandar in ku dixwazin hêza xwe li ser hisabê welatên din û civaka cîhanê xurtir bikin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan sîstema kapîtalîsta nûjen ji bingeha wê ve red dike û tekez dike ku ew li ser jihevxistina û parçekirina aboriya civakî ya hevbeş ava dibe. Hem jî Rêber Apo dibîne ku sîstema aboriya ku di destê dewletê û sermeyandariyê de dikeve xizmeta hêzên kapîtalîst û berjewendiyên wan de. Herwiha Rêber Apo dibêje ku sîstema herî guncav ji bo aborî bikeve xizmeta civakê ew sîstema koperatîf û aboriya civakî ye ku civak xwe bi xwe bi rê ve bibe. Ev yek jî dûrî rikberiya aborî ya ku îro Çîn û Amerîk û hwd… didin meşandin li ser asta aboriya cîhanî.

# Jiyaneke bi hezar salî: Sirri Sureyya Onder

**Volqan Elî**

Erdên Anatolî û Kurdistanê nêzîkî hev in. Heta li hin cihan dikevin nava hev. Yan jî bi pênaseyeke hê rastir li ser vê xeta hevbeş a her du welatan, Kurd û Tirkmen di nava hev de dijîn. Dibe ku li her derê Tirkiyê yan her derê Bakur ne wisa be lê bi taybetî li ser erdên bajarên wekî Sêwas, Meletî, Mereş, Semsûr, Riha, Dîlok û hwd. Kurd û Tirkmen di nava hev de dijîn. Ji aliyê mezhebî ve Kurd û Tirkmenên vê derê bi piranî Elewî-Qizilbaş in.

Ji ber vê yekê bi taybetî ji serdema Yavuz Sultan Selimê padîşahê Osmanî pê de Elewî-Qizilbaşên vê derê bi Kurd û Tirkmenên xwe ve li dijî Osmaniyan timî li ber xwe dan e; alîkarî û destek dane hêzên wekî Şah Îsmailê Safewî. Lê kefareta vê pir giran bûye. Mînak, piştî ku Yavuz Sultan Selim xelîfetî ji Memlûkiyên Misrê desteser kiriye, xwe wekî xelîfeyê Misilmanên cîhanê îlan kir bi demekê di serdema Kuyucu Murat de di berxwedanên li dijî Osmaniyan de çil hezar Kurdên Qizilbaş-Elewî, bi saxî hatin xistin bîran. Elewiyên Tirkmen ên vê herêmê jî, têra xwe ji vê tevkujiyê para xwe wergirtin. Herêma Semsûrê jî yek ji van herêman e.

Semsûr ku yek ji van herêman e, ne tenê di van serdeman de di sedsala 13. de jî ji serhildana Baba Îshaq û Baba Îlyas re bibû war û mekan. Babaiyên ku li ser esasên jiyaneke hevpar bi fikriyata Elewî-Qizilbaş li beramberê zilma dewleta Selçûkiyên Anatoliyê rabibûn, ji Semsûrê bi rê ketibûn. Tevî gundî û cotkarên herêmê bi rêxistibûn û meşiyabûn li ser payitexta zilmê Konyaya wê demê. Keyhuserewê melîkê Selçûkiyên demê, nekarîbû li ber hêrsa gundî û cotkarên Qizilbaş-Elewî bisekine û ji ber vê yekê tac û textê xwe yê zilmê yê li Konyaya demê bi cih hiştibû û xwe avêtibû li ber bextê Bîzansiyên Romî.

Dîsa, di sed sala 16. Pîr Sultan Abdal li vê xeta di navbera Anatolî û Kurdistanê de (Sêwas) bibû remza berxwedana Elewî-Qizilbaşên herêmê. Paşê, ji aliyê waliyê Osmanî Xizir Paşe ve hatibû îdamkirin. Îdama Pîr Sultan ji aliyê Xizir Paşe ve, ew di çavê Qizilbaş-Elewiyên vê xetê de bi temamî kiribû destaneke mîtolojîk.

Bi taybetî li vê xetê, ji sedan sal pê de zêdetir ji faktora qewmî-neteweyî faktora mezhebî-olî li pêş bûye. Heta ji wê pêştir, li tevahiya erdên Rojhilata Navîn ti car zanebûna qewmî li pêş nebûye. Ta ku modernîteya kapîtalîst bi jehra xwe ya qewmperestiyê jiyana mirovên herêmê jehrî kiriye... Ya din jî faktora mezhebî-olî bi taybetî li herêmên navbûrî, bi rengê berxwedana li dijî îqtîdarên împaratoriyan bûye. Di van serdeman de feraseta Elewîtî-Qizilbaş ku demara xwe ji Manî, Mazdek, Hallaci Mensûr, Şêx Bedrettin û Babaiyan distîne, çekek serhildana li dijî neheqiya împaratoriyan bûye. Heta beşeke mezin a Durziyên niha li Sûriyê û Libnanê dijîn, ji ber tevkujiyên Osmanî di sala 1600'an de ji derdora Kilisê koçber bûne... Yanî hêvînê heq û heqîqetê timî li ser van erdên navbûrî peyda bûye; ti car li beramberê zorkeran serê xwe neçemandiye: Dema wê hatiye mirin li binê bîrên Kuyucu Murat pêşwazî kiriye, dewran ziviriye xwe avêtiye hemêza çiya û çoletereyên Sûriyê-Libnanê.

Bi kurtî li ser van erdan jehra qewmperestî û neteweperestiyê ti car havên negirtiye: Lê li şûna wê di zemanên qedîm de ol, bawerî û terîqet û mezhebên nêzîkî heqîqeta civakê, temsîla civakê kirine. Ji tevgera Babaiyan heya bi Sırrı Süreya Önder, erdên Semsûrê bûye hêlîna vê têkoşîna hevbeş ya mirovahiyê. Vê yekê kiriye ku bi rastî jî ji pêşeng, pîr û seyîdên ku rêbertiya civaka xwe li vê herêmê kirine, nûr û şewq bibare. Ew ronahiyeke wisa bûye ku yar û neyar tev xistine di bin bandora xwe de. Va yek ji van jî Sırrı Süreya ye. Em çima vê dibêjin? Çawa ew bûyera jê re tê gotin krîza dil ku hê aşkere nebûye ku sedema wê çi ye, qewimî, hemû TV'yên Tirkiye hema bêje demeke dirêj bi erênî li ser wê axifîn. Temam, wekî aşkere ye di vê de roleke mezin a sekna Sırrı Süreya ji bo pêvajoya 'Aşitî û Civaka Demokratîk', heye. Lê ne tenê ev e. Zemîna dîrokî û civakî ku Sırrı Süreya Önder (jixwe bi Tirkî 'Önder' tê maneyê rêber û serok) derxistiye holê, ew kiriye wekî ewliya û zaneyê gelan. Aliyekî wê siyaset be jî, ji ber vê yekê TV'yên Tirkiye nekarîne xwe li ber şewqa wî ragirin. Em ji fikriyeta Rêber Apo fêr bûne ku navendên îqtîdarperest tu car bi rehetî nerm nabin. Ji ber ku Sırrı şewqek girtiye li ser vê heqîqeta neheq a zihniyeta şerxwaz a îqtîdarê, em guman jê dibin ku 'leyistokek nû ya Osmaniyan' be!

FENER



## Em Dibin Yek Ku Neçin Yek Bi Yek!

**Idrîs Henan**

Gelê Kurd di dîroka têkoşîna xwe ya azadiyê de rastî gelek konseptên qirkirina siyasî, çandî û civakî hatiye. Li Sûriyê metirsîtirîn konsepta qirkirinê di serdema desthilatdariya Baas de bû ku çendîn hewldanên partiyên Kurdan ên xwerizgarkirinê jî hebin, li beramberî plangeriyên Baas bê encam man. Ew yek jî xwe dispêre rêbaza ideolojî ya têkoşîna hatiye raberkirin. Lê bi Tevgera Azadiyê re ku welidîna serdemeke şoreşgerî ya nû di dîroka têkoşîna Kurd de bû, têgeh û têgînên berxwedana hebûnê digirin nava xwe jî hatin guhertin. Bi vê yekê re, rêyên têkoşîna xweferzkirî ya ku xwe li hemû meydanan isbat dike, hatin vekirin û merheleya bidestxistina destkeftiyan dest pê dike. Berovajî rêbazên klasîk ên partiyên siyasî yên berê nîşan dane, êdî xêzên nasnameya neteweyî ya Kurd dihatin nîgarkirin.

Serdema Baas a duyem ku bi Beşar Esad re dest pê dike, Sûriyeke navendî ya netewperestiyeke hişk bû ku ji derveyî netewa desthilatdariyê ti netewên dîtir nedihatin naskirin. Ji bona tekûzkirin û kûrkirina vê zihniyetê jî, desthilatdariya Esed di nava hewlên fîtneya etnîkî de bû ku Kurd, Ereb û neteweyên dîtir bîne rûbirûyî hev. Ji xwe bûyera 2004'an jî vê yekê baş rave dike.

Îro jî piştî rûxîna rejîma Esad û hilweşandina keleha netewperestiyê, ji nû ve dagirkerên Kurdistanê li hev kom dibin û di çarçoveya zindîkirina lihevkirinên berê, dijatiya ji Kurdan re tekûz dikin. Çendîn rejîma faşîst a Tirkiyê xwedî çilekiyên mezin û eşkere di axa Sûriyê de be, ewqas jî desthilata HTŞ, li ser bingeha dijatiya ji hemû pêkhateyên Sûriyê re, li hev dike û di çarçoveya şerê li dijî Kurdan de, itîfaqan nûjen dikin.

Di heyamekî wisa bi xeter ku çarenûsa dozên gelan tayîn dike de, girîngiya yekrêziya têkoşîna Kurd, weke hewceyekê dîrokî ya bivênevê, xwe dide pêş. Hemû hewlên seranser ên berê ku di encamê de Kurdan bi wendakirina Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî, baceya wê dan, divê di ber çavan re, weke ders û hişyariya dîrokî, derbas bikin. Yanê ti lûksa me nîne carek din em bi bin kevin û baceyên giran ku sedsaleke din bi me bidin wendakirin, bidin. Îro Kurd beramberî qonaxeke nû ya hevsengiyên siyasî, leşkerî û aborî li herêmê û cîhanê ne. Pêşbînî jî ew e ku rewşa nû, asoyên siyasî yên nû ji doza Kurdî re li herêmê û cîhanê veke. Lew re jî, yekîtiya Kurdan wê rasterast rê li ber naskirina têkoşîna mafdar a Kurdan veke ku dê bandorek erênî li pêşeroja doza Kurd bike.

Gelê Kurd di esasê xwe de gelekî aşiqê yekîtiyê ye. Bi hemû pêkhatiyan re li hev kiriye û bi xwezayê re jî bûye yek parçe. Lew re, vê firsenda dîrokî ji dest nade û îradeya xwe li ser tevgera siyasî ya Kurd disepîne û wan tûşî yekrêziya vîna siyasî dike. Ji xwe tevgera siyasî jî ketiye wê ferqê; eger nebin yek, wê weke gayên reş, spî û sor biçin yek bi yek. Ji ber vê sedema jiyanî jî, îro li Rojavayê Kurdistanê hemû partî, rêxistin, pêşeng, rêveber, layindên siyasî, aborî, rêxistinên civaka sivîl û leşkerî li dora yek maseyê kom dibin û îradeya xwe ya neteweyî radixin ber çavan.

Bi vê zanebûna dîrokî û stratejîk, gelê Kurd û aliyên wî yên siyasî dizanin ku asta têkoşîna Kurd gihayê, dawîtirîn firsenda dîrokî ya parastina gelê Kurd û doza wî ye. Êdî mejû wê kesên ku bi çaranûsa gelekî li ser axa xwe ya dîrokî bi hezaran salan jiyan dike bilîzin, efû neke. Lidarxistina Kongreya Neteweyî ya Kurdî erkekî sereke ya siyaseta Kurd e. Astengkirina wê jî, parastina berjewendiya hizbî û reva ji berpirsiyariyên neteweyî ye. Ancax li ser bingeha yekrêziya Kurd, dîplomasiyeke yekgirtî nava Kurdan de were avakirin.